

Hûn bi xêr hatna pirtûkxaneyên Örebro!

Li vêdê pirtûkên ji bo zarok- u salmezina bi gelek zimanên cude hene. Li cem me pirtûkên bdeng, kursên zimana, pirtûkên di kasêtan de ku bi awayek taybet xwendîne, rojname u kovar hene. Ji bo ku tu karibî deyn bikî gerek karta te ya deynkirinê hebî. Karta deynkirinê, bingeha afirandina konto u bi kar anîna xizmetên weba me ye. Ji bo kar anîna wîfî u komputerên pirtûkxaneyê gerek tu karta deynkirinê peyde bikî.

Tu bi vî awayî karê karta deynkirinê bistînî

Karta deynkirinê ya yekemîn belaşê. Ji bo ku tu karta deynkirinê bistînî yan jî pinkodê bi guherînî gerek tu nasnameya xwe nîşan bikî. Bi otomatên jixwere xizmet te bi vasita karta deynkirinê u pinkodê yan jî bi vasita hejmara kesîn u pinkodê tu karî deyn bikî, ji nu ve deyn bikî u şûnve vegeerî. Zarokên ji 15 salî piçûktir ji bo ku karta deynkirinê peyde bikin gerek destûrê ji serperîştê xwe bistînin. Grêdana mesûlîyetê ku lazime ji aliyê serperîştê werê îmzekirin di malpera me de heye.

Dema deynkirinê

Dema deynkirinê bi piranî 28 rojin. Îstîsna hene. Di dora rezervasyonê de dema deynkirinê kurttir e. Dema ku tu deyn dikî li ser maqbuza ku tu distînî. dema vegeerandinê nîvîsîye.

Ji nuve deynkirin

Heke di dora deynkirina tiştê ku te deyn kirî de tu kes nebin, wê demê tu karî aynî tiştî azamî 5 caran serhev deyn bikî.

Rezervasyon

Dema ku tu pirtûkekî rezerve bikî, u piştê ew pirtûk ji tere hazir bibe, wê demê bi rêya SMS, e-navnîşan yan jî bi nameyê mesaj ji tere yê werê. Çêkirina rezervasyonê belaşê. Tiştê ku te rezerve kirî, tu karî ji kujan pirtûkxaneyên di beledîyê de tu dxwazî bistînî.

Mercên deynkirinê

Deynkirin belaşê.

Ji bo ku deynên te di dema xwe de werin vegeerandin herdem tu bi xwe mesûlî.

Li ser meqbûza ku di dema deynkirinê de tu distînî dema vegeerandinê tu karî bibînî.

Di beledîyê de li kujan pirtûkxaneyê tu deyn dikî yan jî di vegeerînî ferq nake.

Heke tu tiştê ku te deyn kirî dereng vegeerînî, yan jî dereng jinuve deyn bikî, wê demê gerek tu xercên derengmayin- u iqazkirinê bidî.

Xerca derengmayinê: rojê 5 kr serê tiştên deynkirî, ji bo medyayên salmezina, fîlmên zarokan u lîstikên tv.

Xerca îqazkirinê: 10 kr serê îqazê (ji bo medyayên zarokan jî)

Ji bo agahîyên xercên din li bibliotek.orebro.se/avgifter meyzêne.

Tu tezmînatdêrî ji bo materyalên xerabûyî yan jî newin vegerandin.

Tu mesûlê agahîyên xwe yên nav u agahîyên têkilîyê yên din weke navnîşan, mejl u hejmara mobilê ku aktuel bin.

Tu mesûlê hemû deynên ku bi karta te tên kirinî. Ji vê sedemê gelek girînge ku tu karta xwe nedê kesên din. Heke karta te xunda bibe xeber bide pirtûkxaneyê ji bo ku karta te werê îptalkirin.

Serperîşt mesûlê deynê zarokê ye.

Mercên deynkirinê bi temametî di bibliotek.orebro.se/lanevilkor de hene.

Pirtûkxane ji malê de- bibliotek.orebro.se

Tu karî van tiştên bikî:

Di kataloga me de bi gerihî, li e-pirtûka u muzîkê bi hesînî yan jî daxînî, ji dûrve deynkirinê sîparîş bikî, ji nameyên nûçeyan yên pirtûkxaneyê re abone bibî.

Tu meyzînî bê ma li pirtûkxaneyê çî dibî-demên çîrokwendinê, serdanên nivîskara u tiştên din.

Xwendina agahîyên ji bo pirtûk u meqaleyên temayê ji bo zarok, cîwan u salmezinan.

Bi keve bingeha me ya agahdarîya ji bo xwendina rojnameyên rojane ji gelek welatên cude bi bêhtirî 50 zimanî.

Tu karî li ser nivîskara, welata, fon u bûrsa jî li rastîyê bigerihî.

Ji bo ku tu karibî rezervasyona çêkî, medyayên pirtûkxaneyê jinuve deyn bikî u deynê xwe razînî, di malpera pirtûkxaneyê de kontoyekî veke.